

# SEMİYOTİK Çİ YE?

Mehmet YONAT

Yonat, M. (2016). *Semiyotik Çi ye?. Di nav Waneyên Zimannasîyê de.*  
Ed. Altinkılıç. Ü. N.r: 114-130). Diyarbakır: Lis Yayınları.)

Semiyotik xebatên wate-çêkirin û pêvajoyên *nîşanekan*, û komînkasyona wetedar e. Ew di nav xwe de xebatên *nîşanekan* û pêvajoya *nîşanekan* (semiosis), *nîşan* (indication), *designator*, *wekhevûnî*, *analogy*, *metafor*, *sembolîzm*, *signîfikasyon* û *komunikasyonê* dihewîne. Semiyotik zêdetir bi wê aliyê zimanzaniyê ve eleqedar e ku li ser strûktûr û wateya ziman disekine. Xebatên *nîşanek* û sembolan perçeyên *watebar* (significant) yên komunikasyonê ne û kevenşopiya semiyotikê li pey kifşa wan perçeyên *watebar* dikeve. Ji zimanzaniyê cudatir, semiyotik li ser xebatên sîstemên *nîşanekan* yên ne zimanî jî dixebite. Semiyotik pîranî di nav sê şaxan de tê xebitîn: semantik, sentaktik û pragmatik (Chandler, 1997)

Bi awayekî din semiyotik; ne tenê wan *nîşanekan* dixebite ku em di jiyana xwe ya rojane de bikar tînin, le heman demê de wan tiştan jî dixebite ku “temsîl”ên tiştên din in. Bi nerîneke semiyotik ve, *nîşanek* xwe bi formên peyv, wêne, deng, jest û tiştan ve nîşan dide. Lê li gor Saussure, “semiyolojî” ew zanist bû ku wek perçeyek jiyana civakî li ser rola *nîşanekan* dixebite. Li gor Charles Peirce “semiyotik” doktrîna formal ya wan *nîşanekan* e ku bi mantiqê ve eleqedar in. Ji bo wî “*nîşanek*... bi hin kapasîte û bergehane ve temsîla tiştêkî ji bo kesekî bû.

Semiyotikvanên hevçerx *nîşanekan* îzole nakin û wisa li ser naxebitin lê di nav “*sîstemên nîşanekan*” de li ser wan dixebitin (wek navgîn û cure). Ew li ser vê dixebitin ka gelo “wate” çawa tê çêkirin; ew ne tenê li ser *komunikasyonê* lê di heman demê de li ser avabûn û berdewamiya *rastiyê* jî hûr dibin. Semiyotik û şaxa wê ya zimanzaniyê semantik bi gelemperî li ser wateya *nîşanekan* disekinin. Lê John Strock dibêje; *semantik* li ser vê disekin ka gelo peyv tê çî wateyê, le semiyotik xebatên xwe de vê lêdikole; *nîşanek* çawa wate digrên (Chandler, 1997).

Di semiyotikê de tu faraziyeyên teorîk, model û metodolojiyên amprîk yên berbelav tunin ku qebûleke hevpar sitendibin. Semiyotik bi berfirehî di meyla teorîkbûyîna de ye, gelek teorîstên wê li pey avakirina şumûla wê û pîrensîbên wê yên giştî ketine. Mesela, Pierce û Saussure li ser terîfa bingehîn ya *nîşanekan* sekinîne. Peirce senifandineke mantiqî ya tîpên

*nîşanekan* pêş xistiye. Semiyotîkvanên pey wan hatine li ser kategorîkirina **kodan** an **edetan** (convention) sekinîne. Teoriya Saussure wek destpêka pêşketinên curbicur yê metodolojiyên strukturalîstan e.

### **Teorîsyenên Bingehîn yê Semiyotîkê**

Zimanzanê Swîsî Ferdinand de Saussure (1857-1913) hem avakarê zimanzaniyê hem jî avakarê Semiyotîkê ye. Dema ew dimre li pey xwe tu berhem nahêle lê xwendekarên wî dersên wî yê zanîngê wek pirtûk berhev dikin û ev pirtûk bi navê *Course in General Linguistics* (Dersên Giştî yê Zimanzaniyê) di sala 1916an de tê çapkirin. Ji bilî Saussure zanayekî din yê semiyotîkê felyesofê Emrîkî Charles Sanders Peirce (1839-1914) e û paşê jî Charles William Morris (1901-1979) e ku semiyotîka behaviourist pêş xistiye. Teorîstên semiyotîkê yê modern yê navdar jî ev in; Ronald Barthes (1915-1980), Algirdas Greimas (1917-1992), Yuri Lotman (1992-1993), Christian Metz (1931-1993) Umberto Eco (1932-2016) û Julia Kristeva (b 1941).

### **Çima Semiyotîk Girîng e?**

Çima Semiyotîk girîng e? Lewra, ew alîkarê me dibe da ku em “rastî”yê ne wek hebûneke bêalî bibînin ya ku ji şîroveyên însanan azad e. Ew fêrî me dike “rastî” *sistema nîşanekan* e. Dîsa xebatên Semiyotîkê alîkarê me dibin da ku em zêdetir wek tişekî “tê çêkirin” hay ji “rastî”yê bin û di avakirina “rastî”yê de hay ji rola xwe û yê din bin. Bi wê, em dikarin ferq bikin, agahî û wate di dunyayê de yan jî di nav pirtûk, computer an medyaya dîtbarî-bihîstinewer de nîne. Mene ne “transmitted” e û bi wê şiklê derbasî me nabe. Em bi awayekî aktîf wê diafirînin û vê jî li gor wan *kodên kompleks* dikin yê ku bi hev re têkildar in an jî li gor wan **edetan** dikin ku em hay ji wan nînin. Hay ji **codên** bi vî rengî hebûn hem bi xwezayî balkêş e hem jî hêla aqil û mantiq (intellectually) ve hêz dide mirov. Em bi Semiyotîkê vê fêhmî dikin ku em di nav dunyaya *nîşanekan* de dijîn û ji bilî *nîşanek* û kodên ku *nîşanek* di nav wan de organîzekirî, tu rê û rêbazeke din tune ku em tiştan fêhmî bikin. Bi xebata Semiyotîkê ve em hay ji vê dibin ku *nîşanek* û *kod* net in lê em di xwendina wan de dilq diguherînin. Jiyan di dunyayekê de ku roj bi roj *nîşanekên dîtbarî* di nav wê de zêdetir dibin, divê em bizanibin ku *nîşanekên* ku zêdetirîn realîstîk jî çawa tî xwiyane wisa nînin. (Chandler, 1997)

### **Nîşanek**

Xwesteka meneçêkirinê taybetiyeke bingehîn ya însanan e. Lewra, însan wek Homo Significans (meneçêker) jî hatiye binavkirin. Bi awayekî cuda ji afirîdeyên din, em meneya tiştan bi afirandin û şîroveya nîşanekan ve dest dixin. Ji bo vê Peirce dibêje; “Em tenê dikarin di nav *nîşanekan* de bifikirin.” *nîşanek* formên peyv, resm, deng, bêhnên xweş û nexweş, kirin an tiştan digrê. Lê ev tişt di xwezaya xwe de tu mene nahewînin û tenê wexta di nav meneyekê de bin, dikarin bibin *nîşanek*. Dîsa Peirce dibêje; “Tiştê heta wek *nîşanekek* neyê şîrovekirin, nikare bibe *nîşanek*.” Tiştê heta bibe şîroveya tiştê dikare bibe *nîşanek*, yanî divê ew ji xwe wêdetir, îşaretê tiştê bike yan ji bo tiştê hebe an refereyê tiştê bike. Bê ku haya me pê hebe, em têtikiya *nîşanekan* bi sîstemên nas re datînin û wan wisa şîrove dikin. Vê halê *nîşanekan* di merkeza xebatên semiyotîkê de ye. (Chandler, 1997)

Du modelên bingehîn henin yê ku terîfa semiyotîk û *nîşanekan* dikin. Yek ji wan modelan bi pêşengiya Ferdinand de Saussure û ya din jî bi pêşengiya felyesof Charles Sanders Peirce ve hatiye kirin. Em ê niha pêşiyê li ser modela Saussure û paşê jî ya Peirce bisekinin.

### **1- Semiyotika Saussurere**

Li gor Saussure dunyaya fikr û raman, materyalan girseyek bê şikl e. Ziman jî ew amûr e ku van fikr û raman û dangan ji hev derdixe. Li gor vê ziman karê kombînasyona di navbera fikr û raman, û dangan de dibîne (Bircan, 2015: 60). Fikrên Saussure li Ewrûpayê wan fikr û ramanên beriya wî yê di derbarê zimên de guherand û vê ew kir pêşrewê zimanzaniyê struktûralîst. Lewra, li Ewrûpayê ziman wek qadek dîrokî dihat dîtin lê Saussur bi fikrên xwe ve vê rûxand (Bircan, 2015: 46). Xebatên wî yê zimanzaniya structuralîst hem di gelek qadên zanistên civakî de hat bikaranîn hem jî di antropolojiya Levi Strausseê de, Semiyotika Barthes de, deconstructiona Derrida de û nirxandina metnan ya Dristeva de dertê pêşiya me (Bircan, 2015: 44).

### **Li Gor Saussure Têtikiya Zimanzaniyê û Semiyotîkê**


Saussure di vê baweriyê de ye; “Ji bo fêmkirina xwezaya pirsgirêkên semiyolijiyê, tu tiştê qasê xebatên zimên guncav nîne.” Semiyotîk ji konseptên zimanzaniyê gelek fayde hildide. Lewra, ev zanist gelek di bin bandora Saussure de maye û dîsa seba zimanzanî di nav xebatên sîstemên *nîşanekan* de dîsîplîna muhkemtirîn e.

Saussure zimanzaniyê wek şaxeke semiyolojiyê dibîne. Lewra, li gor wî, qanûnên ji bo semiyolojiyê werên tayînkirin wê ji bo zimanzaniyê jî bikaribin werên bikaranîn. Dîsa ew dibêje; “Bi min, pirsgirêkên zimanzaniyê ewil û di serî de pirsgirêkên semiyolojîk in. Gelo semiyotik şaxa zimanzaniyê ye yan zimanzanî şaxa semîotîkê ye? Ev pirs ji bilî Saussure ji hêla hin nivîskarên din ve jî hatiye nîqaşkirin. Ji bo vê meselê Roland Barthes dibêje; “Belkî, divê em formulasyon û îddiaya Saussure bi vê şeweyê ser û bin bikin; semiyolojî şaxeke zimanzaniyê ye.” Lêbelê, her çiqas em ji hêla teorîk ve zimanzaniyê di nav semiyotîkê de cih bikin jî, em ê nikaribin xwe ji adaptekirina modelên zimanzaniyê ji bo kişîfîkirina sîstemên din yê *nîşanekan* dûr bigrên.



### *Nîşanek*

Saussure modeleke *dyadic* pêşkeş dixê. Di terîfa wî de *nîşanek* ji *nîşandêr* (signifier) û ji *nîşanbar* (signified) pêk tê. *Nîşandêr* ew form e ku *nîşanek* wê distîne û *nîşanbar* jî ew konsept yanî fikra razber e ku wê *nîşanekê* temsîl dike. Di vê çarçovê de, *nîşanek* wê *gîstiyê* ye ku di encama têtîliya *nîşandêr* û *nîşanbar* de dertê meydanê. *Nîşanek* çawa *gîstî* ye, *mene* (signification) jî *têtîliya* di navbera *nîşandêr* û *nîşanbar* de ye. Saussure têtîliya perçeyên *nîşanekan* di diyagramê de nîşan daye. Di wê diyagramê de, tîrên jor û jêr nîşan didin, nîşanên *meneyê* ne (signification) û xeta di navbera *nîşandêr* û *nîşanbar* de jî nîşanekê dikin ku ew du element in (Chandler, 1997).



Wek ku me li jor jî got; di diyagrama Saussure ya derabarê *nîşandêr* û *nîşanbar* de, xeta di navbera *nîşandêr* û *nîşanbar* de dihat wê meneyê ku ev her du ji hev cuda ne. Her çiqas ev xet wan ji hev cuda bike jî Saussure van her du terman wek du aliyên pelekê dibêne; yanê ew ji hev nayên veqetîn û bê hev nabin. Yanê yek ya din tîne bîra mirov. Ew ji ber ku bi temamî bi hev ve têtî qebûlîkirin, Saussure dibêje; hebûna yekî pêşîya ya din nîne. Lê eger em bipirsîn ka gelo çima wê xetê di wê diyagramê de hatiye xêzkirin, wê çaxê jî Saussure dibêje, me vê ji bo armancên analîtîk wiha kiriye. Lê teorîstwanên post-binyadger dixwazin vê xetê ji holê rakin.

Em ji bo *nîşandêr* û *nîşanbar* mînakeke zimanzaniyê bidin, Mesela, peyva “vekirî”-ku li ser dikanekê hatiye nivîsîn- *nîşandêr*, peyva “vekirî” bi xwe ye; û *nîşanbar* jî wê fikra razber e


ku tê vê meneyê ev dikan ji bo kar vekirî ye. *Nîşanekek* mecbûr e xwediyê *nîşandêr* û *nîşanbarek* be. Mirov nikare bi tamamî *nîşandêreke* bêmene yan jî *nîşanbareke* bêform bifikire. Mesela, peyva “vekirî”yê dibe ku ji bo *nîşanbareke* din were bikaranîn wek “vekirî”a ku li ser devika şûşeyek hatiye nivîsîn. Di vê rewşê de, ev *nîşandêr* dibe *nîşaneke* din, lewra *nîşanbarê* wê guherîye. *Nîşanekekî* zimanzaniyê têkiliya di navbera tiştê û navê wê tiştê de nîne, lê têkiliya di navbera şablona deng û konseptê wê de ye. Şablona deng di eslê xwe de ne deng e; lewra deng tiştêke fîzîkî ye. Şablona deng fêmkirina pîskolojîk ya wê dengê ye ku ji hêla hîssên kesek ve tê hîskirin.

Li gor Saussure, *nîşanek* ancax dikarin wek perçeyêke sîstemeke razber(abstract) û formal were fêmkirin. Bi konseptê wî, mene *referantial* nîne lê *relational* û *strûktûral* e; yanê têkiliya tiştan mene dide tiştan ne ku tişt di eslê xwe de xwediyê meneyekê ne. Saussure *nîşanekan* wek hebûnên bingehîn qebûl nake, lê li gor wî, *nîşanek* refereyên hevdu dikan. Yanê, di sîstema zimên de, “her tişt girêdayê têkiliyan e”. Tu *nîşanek* bi serê xwe meneyêke xwe tine, lê tenê bi têkiliya *nîşanekên* din ve mene digrê.

### Qiymet (value) û Mene (signification)

Tiştê ku Saussure wek *qiymeta nîşanekê* îfade dike, têkiliya di navbera *nîşanekê* bi *nîşanekên* din yê wê sîstemê re ye. Yanê, tu *qiymeteke nîşanekê* bê *nîşanekên* din yê wê kontekstê de nîne. Saussure ji bo wê meselê zelaltir bike analojîyêke bi leyistika kişîkê ve bikar tîne û dibêje; qiymeta kevîrê kişîkê girêdayî cihê wan e. Lê di aliyê din de *mene* (signification) girêdayî her du perçeyên *nîşanekê* yanê girêdayê têkiliya di navbera *nîşandêr* û *nîşanbar* de ye.

Mesela, Saussure ji bo mesela *qiymetê* (value) vê mînakê dide. Peyva “mouton”a (mî) Firansîzî di Îngîllîzî de di meneya “sheep” (mî) de tê bikaranîn lê qiymeta wan ne wek hev e. Ji bo vê gelek sebep henin lê ew tenê bi taybetî behsa vê kiriye; di Îngîllîzî de, peyva ji bo goştê vê heywanê tê bikaranîn û wek xwarinê tê pijandin ne “sheep” e lê “mutton” e. Lê di firansîzî de mouton ji bo herduyan tê bikaranîn. Dêmek mahiyeta vê peyvê di du zimanan de cuda ye û em *qiymeta* wan bi têkiliya wan ya di kontekstê ve dikarin derxin meydanê (Chandler, 1997).



## Negativî û Dîfferentialî

Saussure behsa *negativî* û *oppositionalitiya* cudahiyên di navbera *nîşanekan* de dike. Têkiliya kilîdî ya analîza binyadgeran li ser *opposîtîona dualî* ava dibe (wek xweza/çand, jiyay/mirin). Saussure dibêje; di çarçoveya naveroka wan de, konsept ne ku bi awayekî pozîtîvî lê bi awayek *negatîv* tê terîfkirin. Tiştê ku her konseptekî karakterîze dike ew tiştin ku tiştên din ne ew in. (What characterizes each most exactly is being whatever the others are not). Dibe ku ev gotin hişê mirov tevlihev bike. Lê ji bo terîfa vê em mînakê bidin. Mesela, eger em bixwazin peyva “sor”a kurdî hînê yekê kurdînezan bikin, gelo em ê çawa hîn bikin? Muhtemelen em ê gelek tiştên sor nîşanê wî kesî nedin, lê bi awayek rihettir em ê pêşî gelek tişt bidin ber hev yê ku xwediyê karakterîstîkên cuda yê teybet in (divê karakterîstîkên wan ne reng bin ji bilî tiştê sor) û paşê ji nav wan wê tiştê hilbijêrin ku karakterîstîka wê ya bingehîn reng û sor e. Bi vê awayî em ê rihettir bigihêjin armanca xwe.

Wexta *nîşandêr* û *nîşanbar* ji hev cûda tîne fikirîn, *negativî* û *dîfferentialî* dertê meydanê. Lê *nîşanek* ku kombînasyona van herduyan e, termeke *pizîtif* e. Saussure lê zêde dike û dibêje, wexta em, bi kombînasyoneke *pizîtif* ve, *nîşanekek* bi *nîşanekeke* din re difikirin, wê çaxê terma *cuda* (dîfferent) ji holê radibe û êdî ev herdu *nîşanek* ji hev *cuda* nînin lê tenê ji hev dûr in (*distinct*).

## Rasthatîfî (Arbitrariness) Edefî (Conventional)

Li gor semiyotîkên Saussurerew, tu tîkiliyeke mecbûrî, bingehîn, dîrekt û mîsoger di navbera *nîşandêr* û *nîşanbar* de nîne û vê yekê jî Saussure bi terma *rasthatîtiya nîşanekan* (arbitrariness of the sign) ve terîf dike. Di ziman de, tu eleqeya forma *nîşander* (hem deng hem jî halê wê yê nivîskî) bi *nîşanbara* wî (yanê di fikra ku ji ber wê deng an nivîsa wê *nîşandêrê* di hişê me de rû dide) re nîne. Yanî tu meneyeke “*dartiyê*” di peyava “*dar*”ê de nîne (Chandler, Sign). Bi gotinek din, nîşanbarek ku nîşandêrek tîne bîra mirov, dibe ku rasthatî tîkeve formek; lewra ew nîşandêr ji bo wê nîşanbarê bibe nîşandêrek tu pêdiviya wê tune ku meneyek taybet an bingeh hilde (Bircan, 2015: 49; Culler, 1985: 24).

Prensîba *rasthatîtiyê* ne tiştêkî nû bû. Pêşiya Saussure, Arîsto û Platon jî behsa vê yekê kirine. Platon di *Cratylus Hermogenesê* de dibêje; Socrates qebûl dikir ku her çi navî tu bidî tiştêkê ew nav ji bo wê tiştê ya rasttirîn e; eger tu dev ji wî navî berdî û wî bi navekî din ve buhuherînî, navê nû ji navê pêşiyê kêmtir rast nîne. yanê qasê wê rast e. Yanê, tu navek di

xwezaya xwe de aîdê tişteki nîne. Tiştê ku Saussure ji vê yekê zêde kir jî ev bû ku *nîşanekên* di nivîsînê de tên bikaranîn jî *rasthatî* nin. Mesela, tîpa “t”yê tê eleqeyeke xwe bi dengê wê re nîne.

***Rasthatîtiya nîşanekan*** conseptêke radîkal e. Lewra ew di tîkiliya rastî û ziman de otonomiya ziman derdixe meydanê. Yanê, li gor vê, ziman ji rastiyê “eks” nake lê wê ava dike. Em dikarin bi ziman terîf bikin ka çî di dunyayê de heye û çî tine. Seba em dikarin bi hemû zimanan ve vê bikin û wê zimanê ku em di nav wê de hatine dunyayê, bi wê jî em dikarin vê bikin. Nexwe, zimanê me rastiya me wê diyar bike ne ku rastiya me zimanê me. (Sturrock, 1986: 79). Lê kesên wek Ogen û Richards vê nêrînê rexne kirine û gotine ji bo konteksta civakî bikaranîna vê ne rast e lê belkî ji bo textên dîrokî rast be. Dîsa ji bo dengên onomatopœtik jî hin îtiraz hatine. Lê Saussurerewan cudahiya heman dengî di zimanên cuda de gotina wan ya curbicur wek delîlek tîne ku ev jî *rasthatî* nin.

Ev pîrensîba *rasthatîti* eger bê sînor were tetbîqkirin, wê çaxê wê kaos derê. Eger bi her awayî *nîşanekên* zimanî wek *rasthatîti* were hesibîn, wê demê ziman nikare bibe sîtemek û fonksiyona wê ya comînkasyonê wê xirab be. Saussure ji bo vê dibêje; “zimanek bi temamî ne rasthatî ye lewra sîstem xwediyê rasyonaltîyeyêke diyar e. *Nîşanek* ne bi awayekî ekstralînguistik lê înalînguistik tê çêkirin. Mesela, divê *nîşandêr* ji combînasyonêke baş-çêbûyî were avakirin. Dîsa, peyvên hevedudanî wek “xweşmêr” bi temamî *rasthatî* nînin lê ji kombînasyonê tu *nîşanekên* bi mene hatiye çikirin. (Rewil û crocodile)

Her çiqas *rasthatîtiya nîşanekan* were qebûl kirin jî ev şexsî nîne. Divê di nav civatê de ev tişt were qebûl kirin. Ji bo ku were qebûl kirin jî divê di nav wextekî de roj bi roj ew were çêkirin. Yanê, *nîşanek* wexta çê dibin girêdayî civat û çandê ne û ev jî taybetiya *nîşanekan* ya *adefî (conventional)* derdixe meydanê. Saussure, dil göstergesinin hem deîşmez hem de deîşebilir oldugunu ileri sürer. Bi gotinek din, her çiqas nîşandêr hîlbijartinek azad e ji bo fikra razber ya di hiş de lê dîsa jî ji hêla civata ku wê bikar tîne ve ne azad e, tişteki mecbûrî ye (Bircan, 2015: 46; Saussure, 1985: 77)

Mesela meneya peyvek ji ber wê sedemê tê wê meneyê ku hemû civat li ser wê meneyê hemfîkirin.

**Ziman (Langue) û Gotin (Parole), û Senkronîk û Diakronîk**

Saussure di pêvajoya xebatên xwe yên li ser semiyotîkê de, termên *ziman(langue)* û *gotin (parole)* pêş xistiye. Li gor wî, *ziman(langue)* dihat wateya sîstema qanûn û *edetan*. Ev *qanûn* û *edetên* bikaranîna zimanî girêdayî şexsan nîne û ji berê ve hene. Lê *gotin(parole)* bikaranîna van *qanûn* û *edetan* bû. Cudahiya di navbera *ziman* û *gotinê* de wek wê cudahiyê ye ku di navbera qod û peyamê, strûktûr û bûyerê, û sîstem û bikaranîna wê sîstemê, tekst û kontextên sîpêsîfîk de henin. Saussure *gotinê* zêdetin li ser *ziman* hûr bûye. Ji bo semiyotîkvanên Saussurerew, tiştê girîngtir wek giştî strûktûr û qanûnên sîstema semiyotîkê bû. Ew li ser bikaranîna wan ya taybet an pratîkên wî nedisekinîn. Mesela ji bo vê jî Saussure dibêje; dema li ser zimanek hate xebitîn, bi taybetî zimanekê biyanî, divê li ser *ziman(langue)* were xebitîn ne ku li ser *gotinê (parole)*. Yanê, strûktûra bingehîn ya *zimên* wê ji jiberkirina *gotinên* bikarêrên wê zimanê kêrtir werê (Chandler, Sign). Yanê, Saussureê ku armanca wî ya bingehîn ew e ku pergalek bîne ji bo peyvên ku ziman pêk anîne, li gor wî qabîliyeta xebirdanê ancax bi destxistina qabîliyeta struktura wê zimanê ve dikare were destxistin û tiştê ku fêmkirinê pêkan dike jî ev strûktûra zimên bi xwe ye (Bircan, 2015: 46)

Nêrîna senkronîk wexta ziman dinirxîne dîroka wê naxe nav hesêp. *Senkronîk*; eslê xwe peyveke Yewnanî ye û ji “bi” û “wext”ê pêk tê. Her çiqas ziman di wextên cuda de xwediyê halên cuda be jî, zimanzanên *Senkronîk* dixwazin ziman di wexteke spesîfîk de terîf bikin. Pirtûkên rêzimanan yên dibistanan mînakên baş in ji bo vê. Lê *diakronîk* zimên bi dîroka wî ve dinirxîne. Zimanê Girekî de ji peyva “through” û “wext”ê pêk tê. Zimanzaniya dîrokî ji bo vê xebateke tîpîk e.

Li gor nêrîna Saussure, divê xebatên zimên bi sîstemeke *diakronîk* wêdatir bi sîstemeke *senkronîk* ve were xebitîn (wek fotografan).

Di dawiya salên 1920an de, Valentin Volosinov û Mikhail Bakhtîn nêrîna *senkronîk* û têkiliya navxweyî ya sîstema zimên yên Saussure rexne kirine. Nêrîna Saussure ya ku *ziman(langue)* ji *gotinê (parole)* pêşdetir dibîne ji hêla Volosov ve hatiye nirxandin û ji bo vê ew dibêje: “*Nîşanek* peçeyek têkiliyên civatê yên navxwe û organîzekirî ye û di derveyê vê organîzasyonê de nikare were fikirîn. Eger werê fikirîn wê bibe tişteke sûnî. Meneya *nîşanekek* di têkiliya wî ya bi *nîşanekên* din yên di wê sîstemê de nîne lê di nav konteksteke civakî de ye ku ew di wê de tê bikaranîn.” Dîsa fikra Saussure ya derbarê paşgohxistina dîrokîtiyê jî tê rexnekirin. Ji bo vê jî rexneya herî zêde ji ekola Pragê hatiye ku Roman Jakobson û Yuri



Tynyanov ji bo vê meselê di sala 1927an de dibêjin; “Di roja îro de, *senkronîzm* îluzyonek e. Hemû sîstemên *senkronîk* xwediyê rabirdû û dahatûyek in ku ew elementên strûktûral yên wê sîstemê ne ku ji wê sîstemê nikarin werên veqetîn.

## 2- Charles Sanders Peirce

Wexta Saussure xebatên xwe yên li ser semiyolojiyê li Ewropayê berdewam dikir, aliyê din yê atlantîkê Charles Sanders Peirce jî modela xwe ya *nîşanekan* pêş dixist. Modela Saussure ya nîşanekan *diyafîk* bû lê ya Peirce *triadîk* bû. Li gor modela wî:

**Representament:** forma ku *nîşanek* distîne (ne hewceye materyal be.)


**Interpretant:** ne şîrovekarek lê hîsa ku ji hêla *nîşanekê* ve çê dibe.

**Object:** tiştê ku nîşanek referê dikê.

*Nîşanek* tiştêk e ku ji kesekî re ji bo tiştêkî di hin nêrîn û kapasîteyan de tê xwîyanê. (A sign... is something which stands to somebody for something in some respect or capacity). Têkiliya di navbera *representament*, *object* û *interpretant* re Peirce dibêje “*semiosis*”. Di modela *nîşanekan* ya Peirce de, “bisekine” ya (stop) îşiqên trafikê di hundirê xwe de van sê têgehên bi vê awayî dihewîne; rûbirûmayîna îşîqa sor ya di xaçerêyê de (**representamen**), sekinîna wesayitan (**object**) û fikara ku divê tu di vê îşîqê de bisekinî jî (**interpretant**) e. Di modela Saussure de, terma ku cihê *objectê* dagrê nîne lê *nîşandêr* dişibe *representamen* û *nîşanbar* jî dişibe *interpretant* (Chandler, 1997).


Li gor Peirce, şîroveyek dikare careke din dîsa were şîrovekirin. Bi vê ve jî *nîşanbarek* dikare rola *nîşandêrek* bistîne û ev tişt dikare heta heta berdewam be. Ev tişt dişibe wê tiştê; dema em ji ferhengekî mena peyvek mêze dikin, di nav wê peyvê de em dikarin mena wan peyvên jî binêrin ku wê peyva ewil dide nasîn û vê tiştê em dîsa dikarin dubare bikin û ev heta heta dikare biçe. Eco ji bo vê yekê dibêje “**semiosis bêdawî**” (unlimited semiosis). Ev tişt dibe ku bişibe terma Saussure ya bi navê **qiyametê** (value) ku dihat menaya têkiliya di navbera *nîşanekan* de. Lê ev tişt ji wê jî wêdetir e.

Her wekî me li jor jî behs kiribû Saussure digot divê xebatên strûktûra ziman bi awayekî **senkronîk** were kirin. Lê Peirce digot divê van xebatan **dîakronîk** were kirin. Pey Peirce ev model di salên 1920î de ji hêla Mikhaîl Bakhtin ve pirtir hatiye pêşxistin.



Varîantên termên Peirce gelek in. Yek ji wan ya bi nav û deng *sêgoşeya semîyotîk* (semiotic triangle) e. Termên vê sêgoşeyê ev in: *sign vehicle*, forma *nîşanekê*; *sense*; hîssa ku *nîşanek* wê çê dike; û *referant* jî, tiştê ku *nîşanek* ji bo wê heye. Xeta şikestî ya di binî de jî tê wê wateyê ku tu pêdiviyêke dîrect ya têkiliya navbera *sign vehicle* û *referantê* tine (Chandler, 1997).

### Nîşanekên Sembolîk, Îkonîk û Îndeksîkal



The development of Mesopotamian cuneiform script

**Sembol/Sembolîk:** Di vê cure *nîşanekê* de, *nîşandêr* naşibe *nîşanbar* û têkiliya wan *nasthatî* û *adetî* (conventional) e. Mînak; bi awayek gelemperî ziman (peyv, freyz, hevok), numare, îşiqên tirafîkê, alayên neteweyî...

**Icon/Iconîk:** Di vê *nîşanekê* de *nîşandêr* dişibe *nîşanbar* an jî îmitasyona wê ye (ji hêla deng, hîs, tam an bêhnê ve wek hev in). Mesela, portre, metafor, skeyl model...

**Indeks/Indeksîkal:** Di vê *nîşanekê* de, têkiliya di navbera *nîşandêr* û *nîşanbar* ne *rasthatî* ye lê têkiliyeke dîrekt bi hin awayan heye (fîzîkî an sebebî). Çavdêriya vê

têkiliyê dikare bê kirin. Wek, nîşanekên xwezayî (duxan, şopa lîngan, bêhnên ne sentetîk), semptomên medîkal (êş), amûrên pîvanê (saet, termometre), sînyal (lêdana derî an telefonê), qeyt (fotograf, film, qeyda deng)... Bê ku em bizanibin gelo ka *nîşanek* di nav kêjan konteksê de ji hêla bikarêrê wê ve hatiye bikaranîn, em nikarin bêjin ka ev *nîşanek nîşanekeke sembolîk, îkonîk* an jî *îndeksîk* e.

Di çarçoveya van her sê modên nîşanekê yê Peirce de, muhtemel e ku guherîneke dîrokî ji modek ber bi modeke din ve werê meydanê. Wek mînak ev tabloya ber ya ku pêşketina

alfabeya mezopotamyayê em dikarin mînak bidin. Ji *nîşanekên îkonîk* ber bi yê *sembolîk* qulubîne. Jixwe Peirce *nîşanekên îkonîk* wek *nîşanekên* herî prîmatîv dibine (Chandler, 1997).

### **Tokens û Type**

Cudahiyêke din ya di navbera sign vehicle û concepta zimanî jî “*tokens*” û “*types*”e ku ji hêla Peirce ve hatiye pêşxistin. *Token* kategoriya gelemper ya zimên e lê *types* mînaka taybet a sîstema zimên e. Dişibe *ziman* (langue) û *gotina* (parole) Saussure. Li gor Peirce, ziman girêdayî van herdu têgehên e. Di vê çarçovê de Eco sê cure *sign vehicle* lîste dike;

- *Nîşanekên tokenên* wan wek *typesên* wan nin (peyvên çapkirî, erebeyên bi temamî wek hev...).

- *Nîşanekên* ku her çiqas *tokenên* wan yek bin jî *typesên* wan xwediyê hin taybetiyên tekane ne (peyvên ku ji hêla kesekê ve tê gotin an nivîseke ji hêla kesekî ve tê nivîsîn...).

- *Nîşanekên* ku *tokenên* wan û *typesên* wan nasraw (identical) in. (resmên tekane yê orîjînal wek Mona Lîsa) (Chandler, 1997).

### **Wekhevî û Cudahiyên di navbera Metoda Analîza Semiyotîkê û Metoda Analîza Naverokî**

Semiyotîk her wekî me got di zimanzaniyê de li ser tekstan jî dixebite û di analîza wan de hin metod hatiye pêşxistin. Ji bilî *metoda analîzê ya semiyotîkê* gelek metodên analîzê yê tekstan hene wek *retorîkal analîz*, *analîza vegotinî* (discourse analysis) û *analîza naverokî* (content analysis). Di qada xebatên mediya û komunîkasyonê de raqîbê *metoda analîza semiyotîkê* ya herî girîng *metoda analîza naverokî* ye. Bi berawirdkirina van metodên analîzê ve em ê bikaribin hinek *metoda analîza semiyotîkê* fêhm bikin.

*Metoda analîza semiyotîkê* zêdetir niha bi xebatên çandî ve eleqedar in lê *analîza naverokî* bi lêkolînên zanistên civakî re eleqedar e. *Analîza naverokî* nêrîneke çendînî ve analîza naveroka tekstên medyayê dike, le semiyotîk tekstên medyayê wek strûktûreke giştî analîz dike. Semiyotîk kêman caran analîzên çendînî dike û piranî nêrînen wiha red dike. Lewra, tişteke ku di tekstekê de gelek caran were dubarekirin nayê wê wateyê ku ew tişt *watebar*(significant) e. Semiyotîkên Structuralîst pirtir li ser têkiliyên elementan ên bi hev re disekin. Semiyotîkên cîkî jî eleqeya xwe didin giringiya wê *watebariyê*(significance) ku xwîner di tekstekê de îltahaqê nîşanekan dikin. Lê, li aliyê din de, *analîza naverokî* li ser naveroka teqes hûr dibe û di

wê meylê de ye ku naveroka teqes wateya tekane û teqes dide. Xebatên semiyotîk li ser sîstema qanûnan disekine yên ku “vegotinê” (discourse) bi rê ve dibin. Em dikarin bêjin ku hin lêkolîner jî *analîza semiyotîk* û *analîza naverokî* combîne kirine.

### **Semiyotîka Edebî**

Semiyotîk li gor Saussure di nav xwe de gelek zanistan dihewand û yek ji wan jî zimanzanî bû. Lê hin zanyarên din semiyotîkê wek beşek zimanzaniyê terîf dikirin û ji bo vê jî qanîta wan ew bû ku digotin semiyotîk rê û rêbazên zimanzaniyê bikar tîne. Teoriya edebiyatê jî semiyotîkê sîd wergirtiye. Lewra, armançek teoriya edebiyatê îşrovekirina metnan e. Metn ji nîşanek û amejeyan pêk tê û dema armanç peydakirina rêzeya amajeyan be, amajenasî (semiyolojî) dibe stratejiyeke berfireh a vegêranê, dibe rexne û rêbaza şîrovevê. (Alan, 2015, r.184). Di semiyotîka edebî de kesên bi nav û deng; Greimas, Eco, Barthes, Riffaterre û Lotman in.

Sîstematîka Greimas ya semiyotîkê hewildanek e ku dixwaze bi awayekê berfireh meneya metnên edebî û yên ne edebî derxe meydanê. Dîsa, ew bi fikreke têgehî (kavramsala) ve metnan nixandiyê. Vê aliyê wî, wî ji Jakopson û Barthes cuda dikir. Lewra, Jakopson û Barthes li ser karakterîstîkên diyar yên metnê an jî edebîtiya metnê disekinîn lê ew li ser diyarbûna meneya metnê disekinî. Yanî li gor wî meriv dikare wateya metneke edebî bi zelaliyeke azamî nîşan bide. Analîza semiyotîk divê avabûna wateyî (semantîk) û vegêranî (narratolojik/tahkiyevî) ya metnan derxe meydanê. Greimas ji bo binyadên wateyî jî têgehîn wekî *binyada kûr* û *îzotopî* bikar anîne. *Îzotopî*, li ser zemîna îfade û naverokê hebûna zemînên fonetîk û semantîk e. Bi taybetî, di navbera daneyên fonetîk û semantîk yên metnê de pey lihevkirinek ketiye. Mesela ji bo vê, soneteke Shakespeare mînak dide;

When fory winters shall besiege thy brow

And dig deep trenches in thy beauty's field<sup>1</sup>

Di vê perçê de *alîterasyona fonetîk* ya “besiege” û “brow” bi naverokê re eleqedar e; ji aliyê din de, *alîterasyona* “dig” û “deep” jî wek dengê kolandinê dikare were fêmkirin. (Ozsari,) Ji ber vê tê gotin ku ew *îzotopiyên* ku di asta fonetîk û semantîkê de di gava pêşîn de dubare ne,

---

<sup>1</sup> Wexta zivistana çilemîn li rûyê te dagir kir  
Di milkê rindiyê de wê çalên kûr werên vedan

heya dereceyekê xwe bi dubareyan nîşan didin. Li gor Greimas dubare hem homojeniya metnê dabîn dikin û hem jî alîkariya hevgeriya wê dikin. (Alan, r.184)

Di mijara şîrovekirina edebî de zanyarekî din yê bi nav û deng jî Eco ye. Fikrên wî yên derbarê şîroveya metnan de di nav du kategoriyan de tê sinifandin; xebatên wî pêşîn û paşîn. Eco di xebatên xwe yên pêşîn de di wê baweriyê de ye ku metnên edebî dikarin cuda cuda bîna şîrovekirin û ihtîmalên ku rê li ber van şîroveyan vedikin gelek in. Berhemên hunerî, tesnîfkirin û îzehkirineke tam û temambûyî li ciyekî, daîm vedibe û fireh dibe, di gelek rehendan de kêşeyên nû tîne mezatê. Ew, rewşeke “*vekirî*” ye, hereket dîke, çêbûna wê didome. (Alan; r. 185, Eco; r.37). Di fikrên wê yên paşîn de pêşî li şîroveyan bê sînor digrê. Herçiqas metnek cesareta şîroveyan teqes bide jî, Eco dibêje, divê *hevgerîtiya navxweyî* ya metnê were kontrol kirin; yan na şîrove wê bibe şîroveya bîzorê ya xwîner (Ozsari,). Teoriya Eco ya ku şîroveyan xwe ji îşaretên metnê werdigire li ser vê bingehe ye: Di nav sêdaqata binyada peyamê û serbestiya şîroveyan de *diyalektîkek* heye. Metin ne wekî dinyaya şîrovekaran serdema navîn yek wateyî ye û ne jî wekî dinyaya şîrovekarên dewra modern bêşikl e. *Vekirîbûna* metnê, dibe sebebê muphemiyê ku metin hem ji şîroveyan wêrek re derî veke û hem jî pêşîya hinek şîroveyan bigre. Wekî din cardin jî di nav pratîka şîroveyan de , ji duh bigre heya îro, helwesteke ku metnan “bi kar bîne” heye. Ev helwest ji îşaretên metnê hereket nake, niyeta xwe li metnê bar dîke, wê “diemilîne”. (Alan, 2015:185; Eco, 2008:79)

Roland Barthes yek semiyotikwan e ku di warê semiyotîka edebî de ciheke xwe yê taybet heye. Barthes “semiyotîka xwe wek ‘dahunanîna’ zimanzaniyê îfade dîke, bi awayek din ew wiha dibêje semiyotîk lêkolîna wan meneyan e ku ew ji hêla zimanzanan ve lewra meneya wan ne saf e ew hatine avêtin û li ser wan nehatiye sekinîn” (Bircan, 2015: 19-20). Ew di serî de fikra Saussure berevajî kir û got zimanzanî ne beşeke semiyotîkê ye lê semiyotîk beşeke zimanzaniyê ye. Ji ber ku her rêjeya amajeyên ku însan ji wan sûd werdigrin, bi riya ziman û piştgeriya ziman dibin realîteyek (Alan, 2015: 186, Barthes, 32-33-34). Barthes di berhema xwe ya bi navê Gostergebîlîm îlkelerî de hin zagon danîne û li gor wî armanca van zagonên semiyotîkê “bi zimanzaniyê ve derxistina têgehên çareseriyê” ye. (Bircan, 2015: 19). Ji bilî vê meselê Barthes di mijara nîşandêr û nîşanbar de jî hin nêrînên cuda tîne. Li gor wî, têgeha nîşandêr ji rûyê fonetîk ê nîşanekê watedartir e. Barthes nîşanbarê zimanzaniyê wek “zêr” a ekonomiyê rawe kiriye. Çawa “zêr” bingeha qiyametên ekonomîk ava dîke, her wiha nîşandêr jî tê wateya formekê ku maneyên zimanzanî tesîs dîke.

Barthes “kendi göstergebilimini dilbilimin ‘çözülmesi’ ya da, daha açık bir şekilde, bilimsel bir dilbilim tarafından saf olmadığı gerekçesiyle bir kenara atılmış anlamlamanın tüm yönlerinin incelenmesi olarak betimler” (Culler, 2008: 81).

## ÇAVKANÎ

Chandler, D. (1997), *Semiotic for Beginners*, Dîroka Gihîştinê: 01.03.2016.

<http://visual-memory.co.uk/daniel/Documents/S4B/>

Ferdinand de Saussure, *Course in General Linguistics*, McGraw Hill Book Company,  
Translated by Wade Baskin. (<http://home.wlu.edu/~levys/courses/anth252f2006/saussure.pdf>)

Özsarı, M. (2007). *Semiyotik Eleştiri: Greimas, Eco, Barthes*. Dîroka Gihîştinê:  
05.02.2016. <http://www.ege-edebiyat.org/modules.php?name=News&file=article&sid=281>

Alan, R. (2015). *Destpêk ji bo Zanista Edebiyata Modern*, Stenbol: Weşanên Pêwend.

Bircan, U. (2015). Saussure'de Dil, Dilbilim ve Göstergebilim. *Sbard*, j. 25.

Bircan, U. (2015). Ronald Barthes ve Göstergebilim. *Sbard*, j.26.

Eco, U. (2008). *Yorum ve Aşırı Yorum*. İstanbul: Can Sanat Yayınları.

FERHENGOK

Kurdî	Tirkî	Îngilizî	Rave
Diyakironîk	Diakronik	Dyacronic	Nirxandina zimên bi dîroka wî ve
Edet	Adet	Convention	Tiştên ku di nav demê de pêk tîn û êdî di nav her hesî de belav dibin.
Edefî	Adet olarak	conventional	nîşanek wexta çê dibin girêdayî civat û çandê ne û ev jî taybetiya nîşanekan ya adetî derdixe meyanê
Gotin	Söz	Parole (speech)	bikaranîn qanûn û edetan e
Îcon	İcon	Icon	Cureyek ji cureyên nîşanekan e. Di vê nîşanekê de nîşandêr dişibe nîşanbar an jî îmitasyona wê ye.
Îndeks	İndeks	Index	Cureyek ji cureyên nîşanekan e. : Di vê nîşanekê de, têkiliya di navbera nîşandêr û nîşanbar ne rasthatî ye lê têkiliyeke dîrekt bi hin awayan heye (fîzîkî an sebebî)
Interpretant	İnterpretant	Interpretant	ne şîrovekarek lê hîsa ku ji hêla nîşanekê ve çê dibe
Mene	Anlam	Signification	Têkiliya di navbera nîşandêr û nîşanbar de ye.
Negatîvîî	Negatiflik	negativity	di çarçoveya opposîtîona dualî de,



			konsept ne ku bi awayekî pozîtîvî lê bi awayek negatîv tê terîfkirin
Nîşanbar	Gösterilen	Signified	Fikra razber ya nîşanekê ye.
Nîşandêr	Gösteren	Signifier	Ew form e ku nîşanek distîne.
Nîşanek	Gösterge	Sign	Tiştêk ku ji bo hebûnek heye, îşaret; ew giştî ye ku ji nîşandêr û nîşanbar pêk tê.
Object	Nesne	Object	tiştê ku nîşanek referê dikê
Qiymet	Kıymet	Value	têkiliya nîşanekê bi nîşanekên din yên wê sîstemê re
Rasthatîf	Rasgelelik	Arbitrariness	Tu têkiliyeke mecbûrî, bingehîn, dîrekt û mîsoger di navbera nîşandêr û nîşanbar de nîne
Representament	Representament	Representament	forma ku nîşanek distîne (ne hewceye materyal be.)
Semantîk	Anlam Bilimi	Semantic	Zanista li ser wate dixebite.
Sembol	Sembol	Symbol	Cureyek ji cureyên nîşanekan e. Di vê cureê de, nîşandêr naşibe nîşanbar û têkiliya wan rasthatî û adetî (conventional) e
semiosis	semiosis	semiosis	Têkiliya di navbera representament, object û interpretant
Semiyolojî	Semiyoloji	Semiyology	Ew zanist e ku wek perçeyek

			jiyana civakî li ser rola nîşanekan dixebite
Semiyotîk	Semiyotik	Semiotic	Zanista li ser nîşanekan radiweste.
Senkronîk	Senkronik	synkronic	Terîfkirina ziman di wexteke spesîfik de
Sentaktîk	Sözdizim bilimi	Sentactic	Zanista li ser rêza hevokan disekine.
Token	Token	Token	kategoriya gelemper ya zimên e.
Types	Types	Types	mînaka taybet a sîstema zimên e.
Ziman	Dil	Langue	sîstema qanûn û edetan
Zimanzanî	Dilbilimi	Linguistic	Zanista li ser ziman dixebite.